



**The Kurdish Centre of  
INTERNATIONAL PEN  
A World Association of Writers  
NAVENDA PEN A KURD  
Kurdisches PEN – Zentrum e.V.**

Dr. Zaradachet Hajo, President – Franzuseck 16, D - 28199 Bremen / Germany,  
Moustafa Rechid, Vice President – Entenmühlstr. 2, D - 66424 Homburg / Germany,  
Berivan Dosky, Secretary – 72 Diamond Road, Ruislip, HA4 0PG / UK,  
Mehmet Sahin, Treasurer – Postfach 90 31 70, D - 51124 Köln / Germany,  
Kakshar Oremar, Member – Gustav-Poensgen-Str. 37, D - 40215 Düsseldorf / Germany,

Mobile: 00 49 (0) 1773351016  
Mobile: 00 49 (0) 17627186964  
Mobile: 00 44 (0) 7854031393  
Mobile: 00 49 (0) 1719351171  
Mobile: 00 49 (0) 17620061534

**Daxuyaniya  
Navenda PENa Kurd  
di biwara îdamkirina  
rewşenbîr û niştîmanparêzên Kurdistanê de  
li rojhilatê welatê me**

Em di wê baweriyê de ne, ku kuştin û îdamkirina mirovên  
rewşenbîr û azadîxwazên ku li peyî bidestxistina mafên  
xwe yê rewa ne, karekî dûr ji prinsîpên mirovayetî ye.

Li gor standardên navnetewî ji bo mafê mirovan jî, biryarên  
wiha tenê ji hêla rejîmên xwînrej û totalîter ve têne dayîn.

Îdamkirina pênc têkoşerên kurd ji hêla rejîma Îranê ve, di  
nav raya giştî ya cîhanê de şokek nû çêkiriye.

Ferzad Kemanger dersbêjek xwîndingehên gundên rojhelatê  
Kurdistanê û hemû evîna wî ew bû, ku zarokên civaka xwe  
hînî xwendin û nivîsandinê bike. Heza wî ji mirovahiyê re  
bêdawî û di çavên wî de reş, spî û zer tev yek bûn.

Ew rojnamevan, helbestvan û çîronivîsekî jîr bû, ku bi  
zimanekî sade û rewan dersên hişiyariyê didan şagirtên  
xwe.

Elî Heyderiyan, Ferhad Wekîlî, Şîrîn Elemhulî Atêşga û Mêhdî Îslamiyan jî her yekî di warekî civakî de xizmeta pêşkeftina civaka xwe dikirin. Ew xwedî manîfestoyeke homanîstî bûn û xizmeta ji gel re karê wan î herî pîroz bû.

Em bangî berpirsiyarên komara Îranê dikin, ku ew êdî dest ji van hovîtiyan li dijî gelê kurd berde. Ji bo çareseriya doza gelê kurd li Îranê, rêya dialogê, rêya herî baş û demokratîk e.

Ev rê dikare rewşa hemû gelên herêmê biguhere û aştiyê bike para wan.

Bila dîktator ibretê ji dîroka cihanê bistînin û qedera Hitler, Mosolonî, Nêron, Sedam Husên û cinayetkarên din bînin bîra xwe.

Navenda PENa Kurd îdamkirina rewşenbîr û azadîxwazên kurd şermezar dike û bi bîr tîne, ku ev cangoriyên Kurdistanê jî bûne stêrnine nû, yên ku bi şewqa xwe wê rêya rizgarkirina gel û xaka me geştir bikin.

Navenda PENA Kurd  
10.05.2010